GULNAME

Stêrkeke xwînşîrîne her tîpeke navê te
her ku ez wan bi bîr tînim
bi îsîn diherikin çemên bextewariyê
gulên zîvîn vedibin li bexçê dilê min.

Her keziyek te qevdek gula mihemedî
her ku li ba dibin
xunavstêrkek dibare li deşta tenêtiya min ya devzirav
bajarek diherike ber bi valahiya xwe
welatek ji nû ve dihê bi navkirin

Çavên te du ewrên zarokwarî
du oqyanûsên bi aram
her ku li min dinihêrî
biharek min dikişîne nava xwe
baxçeyek tê pê ji dengê zarokan

Rûyê te pirteqaleke hevrîşimîne
her ku lê dinihêrim
dinya diguhere di nava min de
ji nişkave vedibe perdeya heyatê

Berken Bereh